


Ji pirtûkxana Casimê Celîl 8



Wien - 2012

Çapkîr — Înstîtûta kurdzanîyê - Wien (IKW)

H.Tûmanyân: Gîkor

Werger — *Emînê Evdal û Hecîê Cindî*


Rêdaktor — *Casimê Celîl*

Nîgar — *K. S. Pêtrov-Vodkîn*

Weşana pêşîn — 1932 Rewan

Karê kompyûtêrê — *Lûsîka Gêrman*

Mîzanpaj — *Cemal Celîl (Alionis)*



ISBN 3 - 902185 - 29 - 5

Ji pirtûkxana Casimê Celîl 8

H. Tûmanyar

Gîkor

Werger: Emînê Ewdal
û Hecîê Cindî



Wien - 2012

Du xeber

Me “Gîkor” guhast ser wê nêtê, wekî ji zmanê zarane. Wextêda zara ew kitêb xwendye bi dil û eşq. Kêfa wana zef pêra hatye.

Hovhannês Tûmanyanyan nivîskarekî kifşe nava xebatçiyê Zakavkazêda. Ewî gele miqale nivîsîne ji emrê xebatçiyê Zakavkazê û ji emrê zara.

Ji wan miqala yek jî “Gîkore”.

“Gîkor” wî çaxî hatye nivîsarê çiçax Zakavkazêda kapitalîzm diha gumreh dibû, pêra jî gund wêran dibûn. Xebatçiyê gunda û zarê mîna Gîkor dihatin bajara boy xebatê, boy paletiyê.


Xwelî dest gundiyê xebatçîda tunebû, xwelî ji destê wana distendin.

Tûmanyanyan “Gîkor” hema ji wê dewranê jî nivîsiye. Nivîsiye derheqa wê zelûliyêda yak wî çaxî bûye û zarongê nola Gîkor mezin bûne.

Lema jî me layîq dît, wekî eva kitêba zû bê neşirkirinê, bikeve destê zarê kurmancê xebatçiyê Zakavkazê di hêna berêda.

Nasi. Me cî-cî xeber nivîsîne bi herfa **B** û cî-cî bi herfa **V**. Mesele – Çûbû, çûvû û yê mayîn. Cîya jî cûmle awqa nêtlî nehatine nivîsarê.

Ji vê yekê heval gere bibaxşînin, çimk têrmînê zimanê kurmancî awqa jî vê gavê nayêne xebatê, tunenin.



Hovhannês Tûmanyán
1869 - 1923

1.



ala Hamboyé gundîda şer bû. Hambo dixwest kurê xweyî 12 salî bive bajêr, şuxulekî jêra bivîne, bide ser sinetekî, seva kurê wî pêşekêkî hînbe, lê dîya Gîkor qayîl nedibû.

– Nikarim, gedengê minî zare, hela nikare tu pêşe jî hîn be, min ne lazimî wî pêşekê-

ye: dîya Gîkor digot û dibiland, lê Hambo guhdarî nedikir.


Rojeke delal bû, lê merivê mala Hambo melûl bûn.

Hambo Gîkor dibir bajêr, gundîyê wan heta kêleka gund pêra hatin, çûne rûyê Gîkor û rêxistin.

Zanîya xûşka wî digirya, “Gîkol, kuda diçî, hêy Gîkol”, – eva gilîya jî Galoê birê Gîkor digot û dikire gazî.

Gîkor zû-zû pajda dinêrî, hela cînarê wan neçûbûn hundurê malêd xwe. Dîya Gîkor hela digirya, pê şalka xwe çevê xwe temiz dikir. Gîkor dabû pêşya bavê xwe, diçû, mîna cara dida çirtika, diçû dihat, carekê jî pij xwe nihêrî ku diha gund ketye pij banî, naxwêne, ji wê şûnda Gîkor pajda dima, pêkol dikir.

– Ha were Gîkor can, ha were, hindik ma, – Hambo digot û diçû, xurca wî jî ser milê wî bû, Xurcika xwe dabû ser milê xwe, xurcîkêda deste titûn, hine penêr, çend nan hebûn. Nêzikî êvarê bû, Gîkor û Hambo ser gelek çîya, ban-



ya û rîya derbaz bûbûn. Gîkor carekê jî berê xwe gundda kir, nihêrî gund wê nav mij û dûmanêda dixuêne, gelekî ji gund dûr ketine.

– Ha, ha, bavo, mala me waye, – ha Gîkor destê xwe dirêjî berbi gund kir, ew-ki gund qet nexuên bû, çûn dîsa.

Roja ewlin gundekî qesidîn, Hambo çû mala nasê xwe.

Xişe-xişa samovara qîçik bû. Qîzeke delal fincane dêstda, şixke-şixka wê bû, dişûşt û dadgirt, keçkê kincê sore delal xwe kiribûn.

Gîkor dilê xweda digot: “Ez ku çûm bajêr xebitîm, ezê Zanya xûşka xwera kincê wa sor bistînim, bivim. Evarê pey şivêra Hambo û xweyê malê qelinê xwe tijî titûn kirin û dikişandin, gilîyê wanî pêşin derheqa Gikorda bû.

Xweyê malê payê Hambo dida, çawa Hambo kurê xwe ji gund anîbû, dixast bibe bajêr, bibe meriv, pêşekki hîn bibe.

Pey gilîyê Gîkorra derheqa şerda xeberdan, paşê derheqa biha, arzanbûna nanda, çika nan çi bahaye bajêrda. Lê Gîkorî westya bû, xewa wî dihat, radîza. Roja dinê rabûn, çûn bajêr, nav bazarê. Tucarekî got:

– Kalê, te ew kurik anîye bikî xulam?

– Belê, ez xulam. – Hambo kurik devda, seva ser rîya wî hilda, çû cem tucar.

– Bîne cem min, ezê bigrim. – Navê wî tucarî bazaz Artêm bû.

2.



ambo bazarda Gikor da ber destê bazaz Artêm.

Artêm Hambora wa got, ko Gikor malê gerekê gêzî ke, pêlava paqîş ke, xarinê bibe dikanê.

Gikor, wê meyarîke wa bîkîra heta salekê.

Salekê şûnda Artêm gerekê ew bîbra dikanê çawa “şagirt”, wekî wî qeydeyî Gikor pêşda bîhata û bilyan bibya.

– Hela muxdarê pênc sala ez tu heqyatê nadim kurê te, çimkî ew qe tişteki nizane, ya rast wekî ez bêjim, gerekê hela tu serra bidî, wekî kurê te hînbe, bibe meriv. Tu fem dikî çi dibêjim, Hambo?

Hambo got: – Hilbet kurê min tişteki nizane, wekî zanîbiya, minê çira banya cem te, min jî anye seba kur hîn be, ber destê camêrê mîna te.

– Wê hînbe, wê her gîliya hînbe, wê kêfa te hînbe...

– Nikolê alyê we nas dikî? Ewî vira niha dikana wî jî heye.

Ew Nîkol li cem min hînbûye, lê hema wexta çûyînê du kevçiyê çayê û tiştê dinê dizî.

– Na, xazêyîn can, eva tiştê nadize, wekî ew tişteki usa bike, ezê bêm milekî wî bigrim û bavêjim çemê hanî Kurrê.

– Erê, hergê kurê teyî helal be, bizanbe, wê ji xwera bive merî...

– Lê, lê, derdê mi jî ewe, begê min, ez qurba, wekî bive meriv, zimana hîn be, merva naske, wekî mîna min belengaz nemîne, feqîr, fuqare. Ew xwe jî alîfbe nasdike. Mekteba gundê meda hîn bûye, xwe jî kurekî çevvekirîye, lê reca min te heye, ku hûn rind guh bidne wî, zare, tifaleke.

Ser vê yekê Artêm Hambo guman kir, derket derva û got kulfeta xwera wekî mêvanara nan û çayê binin.

3.



ambo kurê xweva mala Artêm rûniştin.

– De, niha tu zanî Gîkor can, çika kurekî çawa wê ji te derê, gerek bikî ha... ez çî zanim.. ay Xudê, Hambo kire mirîn û qelina cixarê derxist. Lê Gîkor çar aliyê xwe mêze dikir.

– Bavo, bexîriya van tune?

– Na, lawo, ya van soveye, hela binhêre, ha-ha...

– Bêderê wan jî tunenin!

– Na, lawo, evana bajarlîne, xwe gundîyê mîna me nînin, bêdera bikutin.

– Lê nan ji ku tînin duxun?

– Nan, nan bi pera distînin û tînin duxun.

– Nan jî bi pere distînin, rûn jî, şîr jî, mast jî, dara jî, heta avê jî. Wa....

– Lê ji evî bajarîra Tiflis dibêjin, tu hela qoçax be, tê gelek tiştê teze hîn bî...

– Lê dêra vana heye?

– Lê çawa, heye ew jî mîna me ermenîne, pey Îsa diçin. Binhêre ha, deste xwe bi xwe bigrî, dibe qestîka pera bavên erdê, hilnedî, eger te hilda jî, bibe bêje: “Xanim can, eva perê çine? Min erdê dît.”

– Vira jî çima prîstav heye?

– Heye, lê, bê wext neçî cîya, pere dikevin destê te pûç nekî, hezar kêmasıyê me hene. Xwe jî pak xweyke, şeva lihêf ser te neçin, serma nekî, hey-hey kaxeza mira bişîne.

Hambo hindik-hindik ewledê xwe şîret dikir, lê Gîkor, dihênijya.

– Dibe kurtolê nanê kartu bidine te, xarina ber wana dimîne, gele cara jî dive ew buxun, nedin te, tişt nabe, qey-dê meytarane. Rojin, wê bên derbaz bin.

Hambo dîsa şîret dikir kurê xwe, lê Gîkor raza bû... kur wan roja awqa tişt dîtibû, diha lap westyabû û nikarbû guhdariya bavê xwe bikira.

Dikanada diha cî tinebû, pirtîyê cure-cûre dabûn ser hevdû, êmîş, top û bûkê zara, firxon, avtamabîl, kaçke.

Lê hema wî çaxî oda mayînda Artêm kulfeta xweva şer dikirin.

Kulfeta wî digot: “Evî xame, ji cîyê beyanîyê hatye”. Lê Artêm şa dibû, seba bêheq xulam destanîye.

– Wê hîn be, la-lawo, – dîya Artêm digot. Nato xanim bextê xwe ne qayîl bû. Ew bextê xwe ne razî bû, wê gavê pirçuyê xwe kiribû.

4.



îkor tenê rûniştibû, cîyê xarina Artêm.

Ew îdî nav qulxêda bû. Ew dixebitî. Kincê xwe lap guhastibû, dabû serê xwe kumê “xezêyîni” kevn, Pê kiribû solê kevn, xwekiribû kirasekî wayî pak û rûniştibû cîyê xarinê, wa

difikirî: “ Çira ji gundê xwe hat bajêr, niha ketye kêderê, niha wê çi bike? Çawa rabin, runêm û bixebitim nav van meryê nenas û xerib.”

Hema wî çaxî hate hundur Nato xanim. Xanimê tişteket got. Gîkor pak se nekir, yanê jî fem nekir.

– Hê, terame, cewrikê hirça.

Gîkor tevhev bû, xuyîda, xwest bipirse çika çi dibêje, yek jî dil nekir. Xanim bi hêrs derket derva.

– Hi, – ez xwelî serî te kim, beyanîne û tên serê merya dibin xeta, ez gazî dikim, ew ji cî nalipite, deng jî dernaxe.

– Kuta bû, – Gîkor duşurmîş bû. – Lê çîqa zû kuta bû, çîqa xirab derbaz bû... Niha ez çawa bikim, bavê min jî çû.

Gîkor diha her gilî kutabûyî hesab dikir. Wê demê nişkêva diya Artêm hate hundur. Ewê şîret Gîkor kir, ewê digot: – Lawo, wextê xanim tê, gere tu rabî ser xwe, cava wê bidî, çima ker dibî? Axir usa nabe.

Pîrêra dêdî digotin.

Dêdiyê Gîkor hîn dikir, çawa semevarê bavêjê, pêlava temiz ke, çotkê bigre, feraq bişo.

Xênji pîrê gişk Gîkorra nepak bûn. “Şagirtê dikana” Artêm qerf pê dikirin, jêra dgotin: “Kîkî”.

Birçî bûn ku heye, çetine.

Wexta mala xwe birçî dibû, diçû ji şkefa malê nan danî, kesî ne digot, çima ji kupa penêr derdixist, dixar û diçû çolê, dilîst, yan diçû ber berxa. Wexta birçî dibû, diçû ser kaniyê, yanê binê derextekî rudinişt û dixwar.

Niha vira cûrekî başqeye, çîqa jî birçî bî, gerekê sebir kî heta nîvro, ew jî gerekê gişka nan bixara, paşê ewî. Ew wextê têrmaş jî usa dereng derbaz dibû, heta kur lap ji hal diket.

Carekê jî Gîkor gelekî birçî bû, çevê xwe çarhilqe gerand, dixwest kurtolê nan bidîta, ku bixwara, heta wedê xarinê bihata.

Berê çî didît davîte devê xwe, nanê hişk, xestu. Paşê hinekî fikirî, here cîyê nan, xarina wan. Axrî hîn bû ji sîtîla goştê nîvkeli goşt bikşîne-bixwe.

Lê wekî bidîtina...

Çi tişteki mirdar (xirab) wê jê derketa...

Lê çî bikî...?

Bihêlî – birevî...?

Niha Gîkor duşurmiş bû derheqa revêda, lê çawa bireve, kuda, kîalî û ew jî tenê. Rê nizani, merva nas nakî, lê bav....

Awqa xebitî, xeberda şîret kir: “Rone, lawo, wê bibin tarî jî, wê derbaz bin jî...”

Hela sere wîda bûn gilî-gotonê bavê, “Rone, wê bibin tarî jî, wê derbaz bibin jî....”

5.



engil lêdixstin.

Gikor, banzda ser xwe. Got-
bûnê, wexta zengil lêdixin,
here binhêre, kîye, çi dixwa-
ze. Ew çû derva, lênihêrî û dît
axak du jinava.

– Ew kîne, ê, – deng da ji jor.

Jêla jorê nihêrîn, xanim
kenya, lê xort serê xwe bilind

kir, hevraz nêhêrî û pirsî.

– Xanime malêye?

– Çi werane? – Gikor pirsî.

Ewana diha kenyan, lawkê axa diha hêrs bû, got:

– Em divên, male, yan na?

– Şuxulê we heye?

Ser vê qije-vijê xanim derkete derva.

– Tu bimirî, here derî veke.

Gikor çû derî vekir, mêvan hatin hundur, Nato ji kenya,
çû pêşya wana.

– A, ser çevê min, ser serê min, pake we em bîr anîn.

– We eva ji ku anîye? – axa ji xanimê pirs dikir, lê xanim
kaw dibû Gikorva û li wî dikenya.

– Hûn çi dikenin, hiz dikin ez bidme we xulamê xwe, –
(qerf) û kenê wava çûn hundurê malê.

Nato Gikor şand cîkî, ew jî mêvanara çû mal.

Pey slavara mêvana serhatîya xwe û xulamê Nato kirin.
Ser hatî tamam dirêj bû.

– O, dilê min maşandye, wekî hûn zanbin, çik min ki-
şandîye ji destê Gîkor,

Xanimê digot û serê xwe dihejand.

– Dibêm derxe, bira inda be, here, de hûn xeysetê Artêm
zanin, dibê, guneye, zaruyê gundyane, wê loqe nan buxe, wê
hîn be. Axir kengê, dilê min herçî hebû, ew jî maşya, çû....

– O-oo.... Derdê wan xulama diha nebê, – mêvana cavdan.

Mêvana û Nato xanin weke nîv sehetî gilî-gotin kirin
û hema wexta wana dengê xwe birîn, Gîkor bi xuydanêva
kete hundur.

– Xanim, min êmîş anî.

– Pak, te qenc kirye, – Nato got, – niha here, – û xwe
soromoro bû, lê mêvan kenyan.

– Xanim can, xazêyîn got, êmîşê dinê bihaye, lazim
nîne, bira arzan be, emê paşê jê biha bistînin.

Ser vê yekê mêvana kenê xwe zeft kirin: dezmal dane
ber devê xwe, wekî nekenin. Hinekî jî seva şerma xanimê.
Bona şerma xanimê bidne revandinê, wa gotin:

– Usane, êmîşê vê axrîyê derketin, zef bihane, kî niha
distîne? Paşê jî gotin, êmîş çî lazime, xwe em nehatine seva
êmîş, hûn çî zemetê dikşînin.

Xanim sor bû û dixwest kêmasîyê xwe veşêre.

– Kî zane, çî gotye, fem nekiryê wî mirdarî gemar.

– Kî derewa dike bikeve erdê.

Gîkor ku eva xebera got, gi kenyan, Nato diha nizanbû
çî bigota.

6.



ey verêkirina mêvana, Nato bi hêrs sifre temiz kir, hey Gîkorra jî dida xebera, bextê xwe reş dikir, mêr jî pêra.

– Hela xame, ewleda min, wê hîn be, lawo, dilê xwe fire ke. Ax Xwedê, tu çima ruhê min nastîni? – Mirîna pîrê bû.

– Bo, ez nizanîm, wexta hêrsa merya tê, hûn çî dibêjin “Xame”, de herin hûn xwe hîn kin, xu ez girtya we nînim? – Bûka pîrê diha dengê xwe bilind dikir û yek û yek cava pîrê dida, û dîsa nifirî xwe û mêrê xwe dikir, heta hatina mêrê xwe.

Û wexta dengê mêrê xwe bihîst, diha girya û hêsir ji çeva hatin xarê, bû reqe-reqa fêraqa, çend heb şkênandin, çend hev jî avîtin ser hev.

– Ez dibêm derxe, bila here, ezê şuxulê xulamê te jî bikim, eger timaya pera dikî, usa nabe, yekî pak bigir, bese, ez awqa dest xulamê te bizêrim, ewî ez peritandim, xwe dijminê min nîne?

Bazaz orta malê sekinî û dipirsî çî qewmîye...

– Diha idî wê çî biqewme, ew maye wekî meriv cem xelqê bibe sosret, te ew jî kir, – xanimê dest serhatya mêvana û êmîşa kir.

– A, – kire qîrîn bazaz.

– Ax Xwedê, – dibû mire-mira pîrê.

Bazaz gazî Gîkor kir. Pey gazîkirina wî, Gîkor bû repe-
repa wî, hate hundur.

– Were nêzîk, – Artêm gazîkirê. Gîkor tirsya ji dengê
wî, ji cîyê xwe nelipitî.

– Tera dibêjim, were nêzîk....

Vê carê Gîkor ji cîyê xwe lipitî, lê dîsa cîyê xweda ma.

– Lo kurê kuçka, ez dibêjim here gilya xanimêra
bêje, tu mêvanara dibêjî, wekî êmiş bihaye?

– Min... min xanimê...

Hela Gîkor gilyê xwe kuta nekirbû şemaq gihîştê,
pirîsk ji ber çevê Gîkor pekyan, serê wî dîwêr ket, bazaz ser
erdê jî çend peyna gihande kur û pêra digot: “Êmiş bihaye?
Bihaye, erê?”

Pîrê diricifî, xwe avîte ortê, dixwest rewirê harbûyî paş-
da vegerîne. Nato jî çû pêşda, zara jî dikirin qîje-qîj. Paşê,
gava Artêm heyfa xwe stand, ew jî paşda çû.

Lê Gîkor, Gîkor jî dikire gazî û hewar, lê hewarya wî
tu kes nehat. Nele-nela Gîkor bû: Wey-wey, inê can, inê, –
digot.

7.



ihêrîn ko Gîkor nikare malda xulamtiyê bike, birne dikanê. Gerekê wêderê hûr-mûr bidana bikirçiya, gerek çît bifrota, dikan paqîş kira, wexta vala buya jî gerek gazî bikirçiya bikira.

Gîkor diha nan dibir dikanê. Carekê jî fera desta ser pirêra diçû, lênihêrî ser çemê Kurrê qeyikek, du meriv têda mesî digirtin, yekî tor davîte avê, yê dinê jî miqatî qeyikê bû.

Gîkor dilê xweda digot, wekî vê carê wê mesîya bigrin, lê wê carê tor vala derket, wexta cara duda tor avîtinê, Gîkor got:

- Ew jî bextê minra. - Bextê Gîkorra tor dîsa vala derket. Torçî car dinê avîtê, ew jî bextê Zanîyêra, ew jî vala derket.
- Ew jî bextê Galora.
- Galo jî bêbext bû.
- Lê îjar jî...

Wî çaxî yekî ecem meymûnek digerland û pêra distra.

- Ay-were-were meymûn,
- Şivka serê te meymûn,
- Mîna pîra qûz-qûz,
- Mîna cahila bilîz meymûn.

Cimet tijî ser bûbû, yê din jî dihatin bidîtana.

Gîkor dikir xwe orta cimetêra kira, bidîta, ê ka meymûn çawa dilîze.

Hema wî çaxî nişkêva kîntok tepek serê wî xist, got:

– Biceme, here şuxulê xwe, çi kula te vira heye û hema wê deqê Gîkor bîr anî û revî berbi dikanê.

8.



varê Gîkor kîlerêda qincilî bû serhev, hela çevê wî ji hêsa ziha nebûbû. Sûretê wî hela ji şemaqê xazêyîn dişewitîn, hela teze dengê xanimê hatibû birînê. Hema wî çaxî jî nişkêva şagirtê Artêma hate hundurê malê. Ewî ku Gîkor

dît, pirçiyê xwe kir û çiyê xweda sekinî:

– Ji kilûbê derengî ketî, çêjkê hirçê yanê şuxulekî teyî ferz hebû cem koprnator?

Gîkor serê xwe bilind nekir.

– Bêje, hela bizanbim-hê...

Gîkor deng nekir.

– Nabihîzî, hêy, kêderê bûyî, wekî îro te ez ji birçîbûnê bikuştama, paşê? Wa hêdî-hêdî xeber dida û pêşda diçû, hevekî sekinî, paşê tepek da serê Gîkor. Gîkor herdu destê xwe da ser-serê xwe û diha qincilî ber dîwêr. Vasso dikir yekî din jî bighîne kur, lê dengê xezêjnê Gîkor hat. Dihat.

– Hela bisekine, wê te çawa bike? – Vasso digot.

“Niha wê min bukujê”, Gîkor duşurmîş dibû û merûmî bi carekêva diricifi.

Xezêyîn hat malê. Ewî Gîkor dikanêda kutabû, tenê got: – Nan nedinê, seva hişê wî bê serê wî.

Ser vê yekê Gîkor hevekî hêsa bû. Lê dîsa dengê xanimê dihat: – Derxe, derxe bila here idî...

9.



îkor xwe qinciland, kete bin lihêfê. Şevê xewa min tine, yê min divîne, divê mala wî tine, ax mal tine...

Vasso kilama xwe digot, pêra nan dixwar. Gikor jî bin qilçê lihêfêra lê dinhêrî, paşê serê xwe dikir bin lihêfê, digirya û dikewgirî.

– Hi, çawane, halê te çîye, usane, – Vasso got û pirtî nan û penêr dayê, – de buxe hela xazêyîn nehatye û nedîtye.

Gîkor revand nan û penêr, serê xwe kire bin lihêfê, ke-re-ker dixwar û duşirmîş dibû. Fikirmîş dibû derheqa gündê xwe, wextê nan û penêr frêqet, bê tirs û şerm ji şkevê hildida, diçû çolê, distra. Fikirmîş dibû derheqa wî çaxî, wexta mala wanda şer bû, dereqa anîna wî bajarî. Bavê digot: – Ezê Gîkorê xwe bivim, dê digot, na....

– Wax dayê can, te çawa zanibû eva ecêba? Gîkor hey penêr dixwar, hey jî guhê xwe bel dikir, bona hatina xazêynê.

Lê sibê şebeqê sekinîbû ber derê dikanê.

10.



îkor ber derê dikanê sekinibû,
gazî mişterya dikir û peyê
hûr-mûrê xwe dida.

– Gazîke, hêy çî sekinîî mîna
mirîya, devê teda ho av tine.

Û wa Gîkor dîsa gazî dikir:

– Kerem kin vira, kerem
kin vira, werin vira. Hûndur-
da xazêyn mervê dora xweva

ji kena dibiecîn.

Gîkor usa hîn kiribûn, ku wexta mişterî dihatin, gerekê ewî pêşa wana bigirta, bikişanda hundurê dikanê. Awa dikir Gîkor gelemperar, lema jî zef dihatê kutanê, çimkî kîntoya lê dixistin, gava ewî usa dikir. Cara jî ji germa havînê û zef gazîkirinê diwestya û cî bi cî ber dêrî ser parça radîza.

Wexta razanê cînarê wî yanê jî hevalê wî birnotî danîn, didan ber pozê wî, wan çaxa Gîkor dibênîjî û nişkêva banz-dîda ser xwe. Ser vê yekê dikançî gi dikenyan û laqirdî dikirin, lê xazêyn ji kena şûnda lê dikir qîrîn.

– Radizêyî, kero, çêjkê hirçê, gazîke, hêy...

Û Gîkor dîsa û dîsa dikir qîrîn: – Kerem kin vira, kerem kin vira.

11.



ojekê jî wexta Gîkor gazî mişterîya dikir, du gundî ber dikanê dît û nişkêva xwe avîte wana.

– Kuro, min qe nas nekir, eva çi teva bû, – bi ecebmay ji gundya yekî kire qîrîn.

– Minê ji çeva nas bikra, – payê xwe da gundîk. Ya rast

Gîkor zef hatye guhastinê û belengazkirinê. Maşyaye, kincê xwe jî guhastîye, nedhat naskirinê.

– Lo kuro hela binhêre, temam bûye merî, hela kincê wî, merîfeta wî, – gundî mabûn ecêbmayî....

– Xwelya Hambo serê me, binhêre ewî kurê xwe anî kêderê, ha. Lawkê me wêdarê xinzîra diçêrînin....

Lê Gîkor ew nedidan sekinadinê, pirs pey pirsê dida wana.

– Dîya min çawane? Zarê me çawanin? Bavê min çira nehat? Çêleka me zaye, yan hê na? Gundê meda kî mirye?

– Gi jî pakin, slava tera dişînin, her Sûknans Gukas mir, yek jî Pûçûrans, ewa pîr, yê din gi jî pakin.

– Lê bavê min çima nayê?

– Bavê te dixast, lê çawa bê, ew merivekî tenêye, cefayê malê gi ser wîne.

– Lê tişt neşand?



– Çi wan heye, çi bişîne, tu qeydê mala we nizanî? Îsal nan giran bû, ancax feqîrî tivdarekê malê dîtye, eger heye, gerekê tu bişînî.

– Kes ji mala me nexweş neketye?

– Na, ewe, her ew çêleka we Gulê ji kuleka tewêa Mîr-zera ket û hiştê bû, mirar bû.

– Gulê mirar bû?

– Dîya te merum awqa girya, wekî çevê wê lap werimîn. Pey gotinê, gundikî namek derxist, da Gîkor û got:

– De bêje gotina te çîye, diha em dive te nevinin, emê herin, eger tê hûrmûr dîya xwera bişînî, bide me em bibin.

– Ji kêderê ezê bişînim, hela ez pera nastînim... Hema....

– Hema çi?

– Ez dixazim wera bêm, min bîra malê û gund kirye, yek jî...

– Wa, me jî tirê tu bûyî meriv, te aqil girtye, lê gilîyê usa dibêjî, ku em lap ecêbmayî dimînin.

– Me digot hela tu cîyê zarongê me jî bikî, em bişînin wana bajarêd wa. Tu vira mîna bajarlîya dijî, kincê teze xwe kirye, dest û pê temiz...idî....

Ew metele, mezina gotine, wekî serê xinzîrê danîne ser xalîça temiz, lê serî ji wêderê ketye nav heryê, ew niha ya teye, bira.

Evi cûreyî gundya Gîkor şîret dikirin û axrîyê piştê xwe danê çûn.

Pey wanara Gîkor çû koşê berê, nema bavê xwe xwend. Nemêda bavê wî wa nivîsîbû:

“Delalê min, Gîkor can. Em sax-silametin, em saxî, sla-

metya te dixazin. Apê te, Zanî, Moso, Mikîç, Galo, gişk tera slava dişînin.

Gîkor can, Zanî, dîya te gişk tezîne, xerc ji me dixazin, eger dikarî çend kapêka bişîne...

Teva eyan be, ko çêleka me Gulê jî geve bû, kesek alî me nake”.

Gîkor name xwend û fikirî, kul û derdê malê (tengasiya malê) bîra wî nedîçûn. – Dya te û Zanî tezîne... – Cîyê me tenge....

– Bike gazî, hê...., çi sekinî, av devê te diçe, – jî hundur kirne gazî.

Gîkor destpê kir:

– Kerem kin vira, kerem kin vira, werin vira, hûr-mûra bistînin.

12.



ivstan hat. Tîpî û baran tev da, serma ketê erdê. Te digot ew tîpî û surr mervê kesiv, êtîm digerya.

Axrîyê ewê Gîkor jî dît û lêkir. Arxalixekî ziravî lê bû û dîsa ber derê dikanê disekinî dikire gazî.

Carekê jî pêlek sar hat, mîna surrekî du paxir hat û ket nav dil û cegerê Gîkor. Gîkor ricifi, xên jî wê ew jî zef maşya bû, awqa jî besî wî bû, wekî biketa nav cîya. Û ket nav cî jî.

13.



oxê Artêmî kevinda Gîkorê nexweş radbû, rudinişt. Dêdî, pîrê, rojê du-sê cara diçû te-selya Gîkor dikir û pêra jî ber xwe xeber dida.

– Çi dixazî Gîkor, lawo.

– Avê.....

Dêdîyê av didayê, Gîkor bi destê xweyî ricafî av digirt,

veduxar û dîsa dixast.

– Eva dilê min rehet nake, dêdî, ez ava kanya me sar dixazim, dêdî, ezê herim mala me, dîya xwe dixazim.

Bazaz Artêm fikirî. Gerya, mervê aliyê wan dît, teme kir, seva Hambo bê, halê kurê xwe bipirse. Lê Gîkor jî bir nexaşxanê.

Wêderê gele nexweş hebûn, gi cêrge ser cîyê xwe velez-ya bûn. Ente-enta nexaşa bû.

Gîkor jî cem wana dane velezandinê. Hema wêderê jî bavê Gîkor kur dît.

– Tu çi bûyî, Gîkor can, – bi qujîniyêva Hambo xwe gîhand kurê xwe. Gîkor germêda diqijilî, haj bavê xwe ti-nebû.

– Gîkor can, hatime de, ez bavê teme de, lawo....

Gîkor tişt fem nedikir, her xwe xeber dida û dikir gazî:
“Mîkîç, Zanî, Apî, nanî...”

– Virame, Gikor can, dîya te ez şandim, seva ez te bim malê... tu nayêy? Dîya te û Zanî wê ser xanî sekinîne, hîvya tene, nayêy, cî dibêjî?...

– Kerem kin vira, kerm kin vira....

Digot û dikenya ber pesna.



u roja şûnda! Hambo diçû gundê xwe.

Gîkor kirbû çel. Bin milda kincê ewledê xwe dibir, seva dê ser bigirya. Cêva Gîkor-da çend bişkoşkê nexş, perê reng-rengî û çend derzî dîtîn. Qe ewî seva xûşka xwe top kiribû, banya Zanîyêra...

Hambo diçû û fikirmîş dibû. Gele wext derbaz nebûbû, wexta ew û Gîkor ji gund hatin, çûn bajêr.

Ev ew kevir bû, wexta Gîkor ser rûnişt digot. “Bavo lingê min dêşin, ez westyame. Ewê han, ew derexteye, cîyê Hambo, Gîkor ber rûniştin, rehet bûn, cîyê lê av vexwarin.

Gişk, gişk hebûn, tenê Gîkor tinebû. Roja dinê wexta Hambo çîya û banyara derbaz dibû, Hambo gundê xwe dît. Kêleka gund Zanî, Mikîç, dîya Gîkor, Moso, Galongê çûçik hîviya Hambo û Gîkor bûn, çika wê kengê bêne malê.

Galongê çûk ber dilê dîya xwe dikir gazî: – Gîkol, Gîkol, were, were, were.

